# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993


Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ
Email : Newroz95@hotmail.com

| Hejmar(73) | Nîsan | 2007 z-2619 k | Buha (15 ) p.s |
|---|---|---|---|


## Serfirazî û pêşketin Ji kar û barê we re

*Rêz û silav ji beşdaran re.*
*Ji mîvanên birêz , heval û hogrên hêja û ji birêvebiriya konferansê re .*

Ji Sûriyê , silavên biratî û hevltiyê ji we hemiyan re hene , bihêviya ku lidarxistina vê konferansê li ser riya xebata dadmend ya gelê me yê kurd li sûriyê bi gaveke erênî û serkeftî be , di xizmet nûjenkirin û danheva kurdên li xerîbiyê de be , di çarçewa rêzagirtina destûr û qanûnên welatên Ewropaî de be .

**Birayên hêja , hevalên xebatkar!**

Li Sûriyê , ji ber rewşa awarte , di siha siyaset û desthilatiya tekpartî de , di siha tevdîr û pirojeyên şoven , girtina Keyfî û bêparhêştina gelê me ji hemî mafên wî yên netewî , nemaze mafê bikaranîna zimanê dê , di siha binpêkirina mafên mirovan , çi kurd çi ereb … hwd de , ji xebat û liberxwedanê pê ve , tu rê li ber me nîne .Lewre , parta yekîtî ya demokirat a kurd weke birekî girîng û bingehîn ji tevgera kurd li hundir welêt , di xebata xwe de berdewam e û her dê bidome û bi xêra siyaseta xwe ya hişmend û pîvayî , parta we bi rûyekî sipî ciyê xwe di nav gel de , li seranserî herêmên kurdî û gelek bajarên sûrî yên mezin girtiye û berfirehtir dibe . Loma jî , erk û stobarên me jî mestir dibin , nemaze di warên lêxwedîderketina li zimanê dê , parastin û nûjenkirina hevbendiya demokrat a kurd li sûriyê û mil li mil li gel Berê demodemoqrat a kurd , bona danheva tevgera kurd li welêt bi hêla pêkanîna lidarxistina kongrekî kurdî li Sûriyê .

Li hêla dî bêguman , rol û endametiya parta we li gel partiyên dî ên Ber û Hevbendiyê di piletforma danezanîna şamê – îlan Dîmeşq – de , roj bi roj cîgehê rêzgitin û egera qelaştina rê li ber danasîna dadmendiya pirsa kurd li Sûriyê û geşkirina çanda mafên mirovan , demokrasî , wekhevî , tazîkirin û rûreşkirina nijadperestî û sîstema tekpartiyê li Sûriyê .

**R(13)**

www.arsivakurdi.org

# Heval Ebdela Kolo(Bavê Mesûd) Ji nav me bar kir

Şeva 28/02/2007 an, ji nişka ve, dilê xebatkarê kurd heval **Ebdela Kolo**, piştî jiyaneke tev kar û xebat di ber doza gelê xwe de rawestiya .



1952-2007

Heval **Ebdela**, ji gundê **Abu Ciradê**, nêzîkî **Derbêsiyê** ye, sala 1952an ew ji dayik bûye û sala 1995an ji bo kurdayetiyê, ew du salan hatiye zindan kirin.

Roja Duşembê 09/04/2007an, rêxistina **Derbêsiyê** ya **PYDKS**, çilrojiya wî li dar xist, derdora 700 kes ji dost, heval û hogirên wî, digel nûnerên hin partî û komelên mafên mirovan beşdar bûn. Ev gotinên jêrîn hatin xwendin:

1- **Ismayîl Umer**-Serokê PYDKS.
2-**EbdurehmanElî**-Rêxistina Derbêsiyê.
3-**Siûd Kolo**-Malbata Kolo.
4-**Mehmûd Mihemed**-Rêxistina partiya Azadî ya kurd li Sûriyê.
5-**Ehmed Sîno**-Rêxistina Partiya Demokrat a kurd li Sûriyê-Alpartî-Hevbendî.
6-**Elî Begarî**- Rêxistina Partiya Demokrat a kurd li Sûriyê-Alpartî-Enî.
7-**Mihemed Dawûd**-Rêxistina parta Komonist a Sûrî-Y.Feysel.
8-**Mesûd Kaso**-Rêxistina Partiya Yekîtî ya kurd li Sûriyê.
9-**Ebdulezîz Dawûd.**
10-**Bavê Dara**-Birûska weşana **NEWROZ.**
11-**Bavê Helebçe**-dostên E.Kolo.
12-**Dilêrê Kurd, Hozanê Girkundê, Bavê Haco**- Helbest xwendin.
13-Gotinek bi navê Koma **RONAHÎ** ya folklorê kurdî.

Weşana **NEWROZ**, ev birûska jêrîn pêşkêşî malbata wî û beşdaran kir:

Birûska weşana **NEWROZ** di çilrojiya heval **Ebdela Kolo** de

**Malbata heval Ebdela!**

**Beşdarên bi rûmet …**

Ji piçûkaniya xwe ve, hevalê **Ebdela Kolo** bi sitem û zora li ser gelê kurd wê demê pêk dihat hest bûye, ew tevlî rêzên tevgera kurdî bûye û ji dil û can barê kurdayetiyê hilgirtiye ser milên xwe. Ji ber dilsoziya wî, hemî heval, dost û hogirên wî jê hez kirine, rêz û rûmeta wî bilind girtine, di ber bîrbawerî û çalakiyên xwe de, sala 1995an du salan ew hatiye zindankirin. Lê girtina wî, çavên wî ne şikandiye, berevajî, bi dilekî germtir wî xebata xwe di rêzên partiya xwe de berdewam kirye.

Heval **Bavê Mesûd**, kar û xebateke îjdil ji bo kurdîtiyê dikir, ew dûrî nerînên partiyetî yên teng bû, her berjewendiya doza kurdî li pêş hemî tiştên din bû. Wî, ji hevalên xwe hez dikir, ji tevgera kurdî bi tevayî hez dikir, ji biratiya kurd , Ereb û Aşûriyan hez dikir, ji ber wilo jî, ew welatparêzekî hezkirî û bi rûmet bû.

Bera cihê te buhuşta rengîn be **Bavê Mesûd**, bera dilê te di cih de be ku hevalên te dê li ser riya kar û xebatê di ber doza gel de bi dilsozî berdewam bin. Baweriya me ew e ,ku paşeroj ji azadî, mirovatî û doza gelan re ye, ne ji şovenî û sitemkariyê re ye, wê rojek were ku gelê te bi azad û serbest bijî.

Bera serê malbat, dost û havalên te sax be!. Û sipas

09/04/2007

Weşana **NEWROZ**

www.arsivakurdi.org

**çalakî çalakî çalakî**

****************************************************************************************

# Cejna Jinan

**Bi** boneya cejna jinan li 8î Avdarê , P.Y.D.Ks daxuyanek weşand , li gel wê , gelek jinên kurd ên cefa di ber pirsa kurd e li Sûriyê dîne xelat kirin , û gelek komcivîn û şevbuhêrkên bîranîn û seyranan ji jinan re li darxistin .

Em jî ji aliyê xwe ve , wek komîta rêvebir a deranîna Rojnama Newrozê jinên cîhanê û bi taybetî jinên Kurd bi vê boneyê pîroz dikin ; Wekheviyê ji wan re hêvî dikin , û rola ku ji wan tê xwastin ji wan dixwazin.

**Li** 10.3.2007an , kat " 1 " ê nîvro , li ber roniya daxuyana ragiyandina Şam ya ku xwastî xwapêşandenekê li pêş avahiya dadmendê li Şam çêkê û nerazîbûna xwe bi boneyên 8 û 12 î Avdarê diyarbike .

Hemî hêzên ragiyandinê , li gel wan bi hevpişkiya komîta hevgirêdanê ya Partiya Azadî , Partiya Yekîtî ya Kurd û Teyar Musteqbel û li rex Partiya Elwîfaq , li ciyê seknandinê kom serhev bûn .

Lê hêzên ewlekariyê ya rijîmê li pêş wan sekinîn , ew ji hev belav kirin , dest danîn ser bi dehan ji beşdaran û girtin , piştî demeke kurt li derveyî bajêr , li ser riya Şam – Heleb ew serbest berdan .

Hêjaye bê gotin ku yên hatine girtin Kurd û Ereb bûn . Ji nav wan Riyad Sêf serokê ragiyandinê , Mustefa Cuma sekretêrê Partiya Azadî , Mislêm Şêx Hesem , Fayêz Sare , Heysem Meneh , Hesen Evdilezîm , Elî Elevdela , pênc jin , … H.W.D .

# Ragiyandina Şam û Cejna Serxwebûnê

**Li** roja 17. 4.2007 an , roja serxwebûna welatê Sûriyê ji bin nîrê firansa , dora /100/kesî ji ragiyandina Şam çi Kurd çi Ereb li Helebê çûn ser gora xebatkarê Kurd Ibrahîm Heneno ,yê nemir û bi nav û deng e. Ew xebatkarê ku , jiyana xwe li ser riya azadkirina Sûriyê ji bin nîrê sitemkariyê daye . Li ser gora wî birêz Fatîhe hate xwendin , û rêzdar Hesen Ebdilezîm jî gotinek bi navê ragiyandina Şam pêşkêşî giyana wî kir .Di gotinê de , giringiya roja 17 Nîsanê diyarkir , xebat û cefakêşiya Ibrahîm Heneno û hemî xebatkarên serxwabûna Sûriyê berçav kir

.Şîngirî:Li 12 î Avdarê îsal , bi boneya bûyera kambax ya sala 2004 an ; ji bîranîna xwînên wan pakrewanan , û pirotêsto û rûreşkirina yên li dû wê bûyerê , gelê me yê kurd li Sûriyê li hemî herêm û bajarên ku lê dijîn 5 kêlîk bêdeng li sukak û kastînan rawestiyan .

Tevgera Kurd li Sûriyê baxên gul û çîçekan danîn ser gorên wan şehîdan û fatîha ji bo giyana wan hate xwendin . Li hin ciyan jî gotin hatin pêşkêşkirin .

Herweha gelê kurd li Sûriyê , 16 î Avdarê , Helebça bi çekên kîmawî şewitî û mirina dora 5000 Kurd , bi pênc kêlîk bêdeng û li hin ciyan bi meş bi bîra xwe anîn . Bi dengekî bilind gotin na ji van karên hovane re û hemî kesên li pêş bên dadgeh û cezakirin .

www.arsivakurdi.org

# Nîsan heyva seyranan e

**Li** 13/4/2007an de , roja înê , rêxistina partiya Yekîtî ya Demoqrata Kurd ya xwendekaran li Zanîngeha Helebê , seyranek navendî ji 2000 xwenkarên Kurd yên zanîngehaq Helebê ,li Kurdaxê , li ber gola Meydankê ya rengîn li darxist.
Hêjaye bê gotin ku, ne kêmtirî



**Seyrana Xewndekaran**

hejmara xwendekaran , temaşevan ji vir û ji wir tevlê bûn . Pirograma şahiya seyranê ji kat 10ê sibê de , li ser şanogehê bi awaz , mûzîk û sirûda Ey Reqîb destpê bû . Herweha piştre gelek stranbêjên ji Cezîr , Kobaniyê û Efrînê stranên xweş û şêrîn pêşkêşkirin . Ji wan stranbêjan **Xesro**, Girûpa **Baran Kendeş** û stiranbêj **Welat , Rêber Armanc** , **Newroz , Zekeriya Dil Can û Sîwar** Hedad…H.W.D .
Xwendekaran jî bi xort û keçan ve , li ber dengê awaz , dahol û stiranan ji sibê ve ta dawiya şahiyê , berdewam direqisîn, didan çepik û lîliyan . Weha bi kêf , xweş û aştiyane seyran bi dawî bû û vegerîn mal .

*- Bi boneya cejna Celaê , û 22 Nîsanê roja rojnamegeriya Kurd , rêxistina P.Y.D.Ks ya karkerên Helebê bi alîkariya hin he valan ji



Şamê, seyaranek ji dora 7000kes re , li 20/4/2007an , di hembêza xwezaya **Nebî Horî** de li dar xist . Seyran ji 10ê sibê ve , bi sirûda Ey Reqîb destpê bû û pişt re bi stran , reqis û şanoyên komên filklorî mîna **Yekbon, Kurdax , xormal , Rohilat , Rojhilat, Nûhilat û Perwer** û H.W.D xweş û geş bû . Lê , bi tevanlêbûn , dîlan , çepik , dahol û lîliyên temeşevan herçû seyran xemilî û bi siruştê re bû yek.
Gotina birêz Mihyedîn Şêx Alî sekretêrê P.Y.D.Ks jî viyana xelkê germ û bi hêzkir . Herweha ta dawiyê bi awakî xweş û bê ziyan , xelkê me vegerîn malên xwe . Aqûbet li salên were bin .

**Kela cehberê**: Bi boneya roja rojnamegeriya Kurd, rêxistina P.Y.D.Ks ya Reqê û Girê Sipî , di 27/4/2207 an de, seyranek li **kela Ceberê** li dar xistin . Seyran bi govend, reqis û lîliyan ta dawiya rojê berdewam kir.

www.arsivakurd.org

# Cejna Newroza 2007 an

Îsal jî weke hersal , li êvara 20an , gelê me yê Kurd li Sûriyê bi mûm û find , û aletirîkên rengareng li ser xanî û balkonan , vêxistina agiran li ser gir û çiyan , li darxistina meş û



festîvalan li kastîn , xaringeh û şariyan , bi çepik , stiran û lîliyan , dahol û zurnan û reqis û seman pêşewaziya NEWROZA xwe , Newroza azadî, astî û wekheviyê


## Newroza Cezîrê

Herwiha roja di 21ê Avdarê li Cezîrê , Reqê , Kobaniyê , Heleb , Efrîn , Laziqiyê û Şamê gelê me bi keç , xort, kal , pîr , jin û mêran ve berê xwe dane siruşt û xwezoya şêrîn , cîgehên şahiyên cejna NEWROZê . Û bi hemî aw û şêweyên şabûnê yên naskirî û pê zanîn bi coşeke mezin NWEROZa xwe zindî kirin .

Hêja ye em bipirsin , çima di hemî çalakiyên îsal de , tu bûyer kambax û nexweş weke hersal derneketin holê ? Milet yê hersal e . Cejin , bûyer û çalakî jî yên hersal in .

Di baweriya me de , bersiv ev e : Gelê me hertim azadîxwaz û aştîxwaz e , eger kes dest tê nede . Tenê destlatê îsal çavsorî li me kêmkir

## Heval Nezmî jî barkir



Nezmî Kurê hesen , di sala 1962 an de, li gundê Çençeliya, ji dayîk dibe. Di sala 1991 an de, derbasî nav refê partiya Yekîtî dibe.Di 28ê Nîsana 2007 an de, piştî nexweşiyê. Dilê wî radiweste. Bi beşdariya xwedî, hogir û hevalên wî, di goristana gund e tê veşartin. Li ser gurnê, gotina partiya wî tê xewndin : Naveroka gotinê ev bû .

**Gelî beşdaran ….**

Îro kombûna me li ser goristana **Çençeliya** ji bo goçbarkirina hevalê me yê hêja Nezmî, heval Nezmî ji nav me barkir.L lê kar û liva wî, ji bo gelê xwe li ber çavên me ye. Armanc û hîviya hevalê me ku, gelê me jî weke hemî gelên cîhanê bi serbest û azadî bijî .


Bila serên mal, xwedî , hogir û hevalan sax be.

www.arsivakurd.org

# .Bîranîna 109 saliya rojama Kurdistan

**Reşoyê Pîrê**

(**R**ojnamegerî, awayên gel e , zimanê nêrîn û ramanên wî ye , daxwaz , pêdivî û armancên netewî bi hêz diyar dike û dide xuyan )



Rola rojnamegeriyê , ne tenê , ji bo parastina dîrok , çand , ziman , her tiştê bi gel ve girêdayî girîng e , bel.ê , bilî wê jî , hemî bûyer û rûdawên di pêvajoya dîroka wî miletî de , bûne diparêze . Ji bo parastin , pêşxistin û dewlemenkirina zimên, rojnamegerî xwedî roleke pir berz e. Rojnamegiriya her miletî vê rolê hildide ser milên xwe . Bi kurtî mirov dikare bêje, rojnamegerî “ mirin û jiyan bi xwe ye”

Gelê Kurd wek netw, di rojhilata navîn de, kevnartirîn milet e. Xwedê roleke erênî di avakirina şaristaniya vê herêm. de lîstiye. Ji bo maf û azadiyên xwe , bi dehan raperîn û serhildan rakirine. Lê mixabin, wek dewleteke serbixwe nehatiye avakirin û zimanê wê nebûye zimanê dewlet û desthilatan. Dagîkeran, welatê Kurdan, bi her awî xebitîne ku, Kurdan ji holê rakin, çand û ziman tune bikin û wan ji netewbûn û taybetmendiyên xweser bikin. Ji ber van sedeman jî, rojnamegeriya Kurdî dijwartir bûye. Li hember vê zordariyê, Kurdhez, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd , ji bo vê riya pîroz pir caran giyanê xwe kirin qurban .

Ji ber zilm û zora destlata Osmaniyan, pir kurdperwer, rewşenbîr û têgoşerên Kurd penaberî dûriyê bubûn.. Li dûriyû, merc, heyam û bûyerên nû peydabûne. Di wê rewşa neçariyê de û li gor wan merc û bûyeran, rewşenbîrên me çekên xwe guherîn , çeka hişyarî , zanebûn, raman û zimanê dê rakirine.

Di rewşa neçariyê de, li Misirê – Qahîrê - Şahsêwarê pyevê, mîrê gewre, Miqdad Midhet Bedir-xan dest davêje pênûsa xwe, kar û xebata rojnemevaniyê dike. Di 22 . Nîsana 1898 an de, yekem rojname bi zimanê Kurdî bi navê (**Rojnama Kurdisan** ) diweşîne. Li gora berpirsiyar û xwediyê rojnamê, di hejmara yekê de nivîsiye ku, rojnama Kurdistan wê her ( 15 ) rojan were weşandin. Ji 22 . Nîsana 1898 – 1902 an sî û yek hejmar ji rojnamê hatin weşandin, (1-5 ) li Qahêrê ,( 6-19 ) li Cinêv , ( 20 –23 ) li Qahêre ( 24 ) li Londin , ( 25-29 ) li Folkston û (30-31) li Cinêvê. Ji ber guhartina cihê wê, ev rojname , bi rojnama gerok hatiye nasîn. Lê mixabin, ew soza xwediyê rojnamê daye, ji ber merc û nîrên heyî pêknehatiye. Piştî derçûna hejmara 5 an ji rojnamê û belavkirina wê li nav Kurdan, Sulatnê Osmanî , bi çavsorî li hember rojnamê sekinî û bi destê zorê, M . Bedir-xan vedigerne Stembûlê. Lewre, birayê wî mîr Ebdirehman, li Cinêvê berdewamiya derxistina rojnama Kurdistan dike. Di hejmara şeşan de weha dinivse (( ***Ev cerîda biraê min Meqdad beg derdnî, lakên çiko xinkar nehêşt ew li Misirê ronît, vegera Istenbûlê, cerîdeya xwe nikaî li Istenbolê derbînêt*** ))

www.arsivakurdi.org

# Ahenga Roja rojnamevaniya kurdî Li gundê Elî Bedranê

**Di** bîranîna 109 saliya roja rojnamevaniya kurdî, li gundê ELÎ BEDRANÊgundê ŞAHA REMO de, partiya me partiya YEKÎTÎ YA DÎMOQRAT A KURD LI SÛRYÊ (YEKÎTÎ) festivalek li darxist, gelek rewşenbîr, helbestvan, nivîskar, hunermend , rojnamevan û jimarek ji kesayetiyên Ereb û Asûrî vexwestîbûn vê fistîvalê.

Koma MÎDYA û bi beşdariya koma RONAHÎ ya ALIYAN, koma DÊRIKÊ, TIRBESPIYÊ, MÎTAN, HELEBÇE, RONAHÎ. Destpêkê pîpinokek bê deng û lebat li ser canê pakrewanên kurd û kurdistanê rawestiyan, dûre sirûda EY REQÎB, gelek stiran, şano û dîlan ji cemawer re pêşkêş kirin, di nav re gotina kovarên kurdî , birûska weşana NEWROZ hate û gotinek ji aliyê helbestvan KONÊ REŞ ve hate xwendin, gotina Ragihandina Şamê jî ji bal mamoste ZUHÊR ELBOŞ ve hate xwendin. Nûnerê WEŞANA NEWROZê ev hevpeyvîn bi hin ji mêvanên fistîvalê re kirin:



-**MIHEMED QASIM** (Ibnilcezîre):

Rojnama kurdî gelekî li paş e, siyasetê cihê rojnamê girtiye, rojname pêşnakeve ku xizmeta gelê xwe neke, tê xwestin avakirina rojnamek çerxvan û destgehî, ji partiyan tê xwestin ku destê xwe ji ser rojnamevaniyê hilînin û kesê rojnamenas divê tê de bi xebitin

**BERZO** (nivîskar) : Rojname gelekî li paş e ji aliyê cûreyî ve kovar in hene derdikevin wek NEWROZ, HEVIND, PIRS çerxane ne. Lê hine din hene, gerek navê rojnamê li wan nebê, wek nimûne GELAWÊJ, ji ber ku demek dirêj di navbera jimarekê û ya din de heye, ji vê jî nivîskar ji wan bazdidin. Rola nivîskaran gelek heye; ji ber ew çavê gelê xwe ne, kesên serbixwe nikarin bi tena xwe derxin, bêyî partiyan nayê derxistin, astengên rojnamê bi rewşa kurdî û mafê rewşenbîran ve girêdayî ne.

-**EMER RESÛL**(rewşenbîr): Rojnamevanî karekî gelek pîroz e, rola wê gelekî di pêşveçûna miletan de heye, ta em rojnamek durust û girêdayî bi doza gelê xwe ve peyda bikin, rojnamek azad giringe, astenga sereke ew e peydakirina xwendevanekî kurd e, ya din belavbûna tevgera kurdî ye.

- **Dr.SERBEST NEBÎ**: Gerek em weşana pirobagandeyî û pirsgirêka rojnamê ji hev derînin, rojname ferehtir û giştyantir e ji belavokên aydiyolocî û probagandeyî xwedî dûrbûnek arîşenî, ez nabînim ku dîroka rojnama kurdî dest pê dike bi derketina kovara KURDISTAN ya di sala 1898z derketî, rojnama kurdî û çi rojnamek heyî ,yek ji mercên wê, hebûna civakek şarewerî serbixwe ye,

www.arsivakurdi.org

xwe naske ku civakeke di hember desthilatekê de ye, ev rojname dikare bandora xwe di rûbirûkirin û çêkirina raya giştî de bike, rojname ne dûrî siyasetê ye, lê divê dûrbûna wê yî karbendî em ji bîr nekin.

-BESSAM ELTEEAN (çîroknivîs) : Min gelek rojnamên kurdî xwendine nemaze yên li kurdistana Iraqê tên weûandin, ez wek çîroknivîs pêwîste hemî kovar û weşanan bixwînim, yên kurdî hin ji wan hene gelekî baş in, bi babetên xwe û bi rengerengiya xwe, hine din hene di cihê xwe de pîkolê dikin, yan jî bi gavine fedok dimeşin, ez bi hêvî me ku ji bin sîwan û razîkirina çavdêran derkeve, da nebe rojnamek rengmirî. Ez bi hêvî me di hundurê rojnameyên kurdî de gotar û babetên daxwaza biratiyek rast di navbera hemî gelên Sûriyê de peydabibin.....û ez bi hêvî me alîkarî hebe di navbera rojnamevaniya kurdî û erebî de, û armancê wan bibe çareserkirina pirsgirêka niştimanî li Sûriyê, welatê me tevan.

- EDNAN BEŞÎR (rewşenbîr): Giringe ku bîranîna rojnamevaniya kurdî bibe derfetek ji bo dan û sitandin û giftûgoyan li ser rojnamevaniya kurdî, ya ku ne gihaye radeyeke bilind ku mejiyên rewşenbîran têr bike û êşên milet bide nasîn.

Ji bo şoreşa rojnamevaniya kurdî, ji me tê xwestin em ji ezmûnên miletan sûdê bigrin. Malperên kurdî pêşketîtir in ji yên partiyan û ta rojnamevaniya kurdî pêşkeve, pêdiviye peyvek azad heye.

Li lêr, em deqa birûska weşana Newrozê û gotina Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yê li Sûriyê têne weşandin belav dikin:

## Birûska weşana NEWROZ

Berî 109 salan, di roja 22/04/1898an de, yekemîn rojnameya kurdî, bi tîpên Erebî û bi navê **KURDISTAN**, li Qahîrê, paytexta **Misrê**, ronahî dîtiye. Xwedî û berpirsiyarê wê, **Mîr Miqdad Midhet Bedirxan**, xameya xwe ya zêrîn kişandiye, bi hişmendî û dilsozî li ser rewşa nezanî, belengazî û preîşaniya gelê kurdistanê nivîsandiye, qencî û çakiyên zanînê, xirabî û malwêraniya nezaniyê di rojnameya xwe ya nû de anîne zimên. Xemxurê gelê xwe, Mîrê mezin, hawîr dîtiye ku hemî gelên hevsînorên kurdan bi zimanê xwe dixwînin, dinivîsin û pê perwerde dibin, wî ji xwe pirsiye ma gelo qey zimanê kurdî ji zimanên gelên din qelstir û hejartire?!!..Radibe dest bi weşana rojnameya xwe dike û gelek hejmarên wê ji kurdan re bê pere rêdike kurdistanê da ku ew hînî zanistî û ramanên teze bibin.

Mîrê gewre, ji beg, axa û zanayên welatê xwe xwestiye ku ew bi rola xwe rabin, li doza gelê xwe xwedî derkrevin û berevaniyê di ber rûmet û hebûna wî de bikin, herweha di hejmarên wê de daye zanîn ku **Sultan Ebdulhemîd** di bin bandora şêwirdarên xwe yên zikreş û nijadperst de yên mîna (**Abu alhuda**), rê nedaye wî ku ew rojnameya xwe bi zimanê dê û bavê xwe li welêt biweşîne, ji ber wilo ew neçar maye ku li derbederiyê, rojnameya xwe biweşîne. Lê,

Sultanê teralî serxweş qîma xwe bi vê yekê jî ne aniye, fermana girtina wê daye. Lê belê, rojnameya Kurdistan, biryara berdewamiyê sitandiye, ji ber êrîşên hovane yên dstelata Osmanî,
cihê xwe ji welatekî guhestiye welatekî din, tîrêjên zanistî û rewşenbîriyê li welêt belav kiriye.

Digel tunebûna dibistan û zanîngehên bi kurdî û êrîşên tund ên dij gel û zimanê wî, bi saya serê xebatkar, zanyar û têkoşerên gelê me, zimanê me li ber xwe daye û di şerê tunekirin û pişaftinê de bi ser ketiye, xwe parastiye û îro bi milyonan kurd seranserî Kurdistan û cîhanê pê dixwînin û dinivîsin.

Di vê bîranîna pîroz de, em bi navê weşana **Newroz** hemî nivîskar, helbestvan û rewşenbîrên kurd pîroz dikin, bi hêvî ne ku em hemî bi hev re riya mezinên xwe bişopînin, xameyên xwe ji bo berjewendiyên gelê xwe bikar bînin û hemî bi hev re gurzek gul pêşkêşî giyanê nemir **Miqdad Bedirxan**, **Malbata Bedirxaniyan** ku ji rewşenbîriya kurdî re bûne hîmine berz û hemî xemxur berketiyên ziman û çanda kurdî bikin û cejna we pîroz be.

Desteya weşana **NEWROZ**

## Gotina kovarên berpirsiyar di bîranîna 109 saliya rojnamegeriya Kurdî de

Em,bi navê kovar û rojnameyên Kurdî,yên li Sûriyê têne weşandin (**Aso; Jîn; Hevind; Deng; Gelawêj; Newroz; Perwan; Pirs; Roj; Vîn**),bi navê **komîta fêrbûna zimanê Kurdî**; **komîta Celadet** û bi **navê komîta çalakiyên kurdewarî**,wilo jî bi navê hemî piştgir û heskerên ziman, rojname û rojnamegeriya Kurdî,vê bîranînê li xwe û we pîroz dikin.

Bi helkeftina vê bîranîna pîroz, bîranîna 109 saliya rojnamegeriya Kurdî ,em dibînin ku kovar û rojnameyên binavkirî pêma û berdewamiya rojnameya Kurdistan in û nivîserên wan pêma û berdewamiya rewşenbîriya Kurdî ne, ew in yên çapemeniya Kurdî,di demên serwext de, hembêz kirine û hembêz dikin û hêja ne ku nûnertiya rojnamegeriya Kurdî, li Sûriyê,bikin. Bo vê yekê,em wî mafî didin xwe,didin kovarên xwe,didin nivîser û xwênerên van kovaran,ku ew in xwediyê rasteqîn ji rojnamegeriya Kurdî re,li Sûriyê,û pêşdeçûna rojnamegeriyê ji wan tê xwestin û bi wan nîşan dibe. Loma,em bi hêvî ne,ku bîranîna 109 saliya rojnameya Kurdistan(roja rojnamegeriya Kurdî) bibe zîlana rolnaskirina rewşenbîrî û bibe hêzeke xwirt di riya çespandinên resen û petî de. Da em,bi hev re,desthilatê avakirina weşaneke şûngirtî bin,da pirsên rojnamegeriyê di çerxeke ronîda de bigerînin,da xameyên me bibin neynika pirsên civaka xwe û bi erkên rojnamegeriyê rabin,da desthelatê vejîna kevnetoreya xwe bin û karibin civaka xwe ber bi banbilindiyeke mirovane û şaristane de bilivînin.

Bêgoman,em pileya rewşenbîrî û rojnamegeriya Kurdî,li Sûriyê,di astengiyeke berbiçav de dibînin û dipelînin.Loma,gotûbêj û gengeşên rojane,bi mebesta çareserkirina vê pirsê,li dar in.Ev guftûgo hewildana pileya bîrgeşî,têgihiştin û rolnaskirina rewşenbîrî dikin,da faktorên banenizmî,bêkêrî û bişûndemayina civaka xwe dorpêç →

bikin,da rola berdewamiya van mercên bêkêr ji holê rakin.Ev danûstandin û hewildan,di behweriyên me de,wê bibin gavavêtineke giranbuha ber bi pelandin û çaraserkirina piraniya astengên demane,yên ku xwe li dora zîlana rewşenbîriyeke resen radipêçin û nahêlin ku rojnamegeriyeke serbixwe û şûngirtî bimeye û cih bigre.Wilo jî,em dizanin ku gelek mercên derveyî desthilatdariya rewşenbîriya Kurdî,li Sûriyê,me di bin bandora xwe de digerînin û dibin sedema sereke ji neşûngirtineke rojnamegerî re.Ji van sedeman: neyîniya pergal û yasayên rêdaneke serfiraz ji çapemenî û rojnamevaniyê re,binçavkirina hemî kiryarên serbixwe ji hêla rejîmê ve,raspêriya hêzên ewlekariya rejîmê di warê raxistina bîr û behweriyên rewşenbîrî de,di warê bidestxistina desthelatdariyeke eborî de,di warê mafdariya bidestxistina dezgehên weşan û belavkirineke serfiraz de,di warê hebûna alavên rûdaneke rewşenbîriyeke serfiraz û bê kontirol de...û di gelek warên din de.

Lê belê,bi ser van kul ,derd, êş û azeriyan de jî,em bi hêvî ne ku wê dem gerş û gemara xwe bi xwe re bimale...û ev bîranîn, li ba kovar,nivîskar,çalakvan û rewşenbîriya Kurd bibe gaveke pîroz di hewildana avakirina çapemeniyeke bi rûmet û hêzdar de û wê bibe durv û. nîşanên civakeke saxlem Û hersal cejna rojnamegeriya kurdî li we pîroz be.

**Komîta Kovarên Berpirsiyar18/04/2007**

-------------------------------

# Li Sûriyê Pêkenoka Hilbijartina Perlemanê

Dîsa , piştî çar salan , destlata Sûriyê ji heyvekê ve , dest bi reqepeq û xirecira hilbijartina ( encûmema gel ) kiriye . Bi hemî şêweyan piropoganda jeer kiriye , wekî ku, rast hilbijartin wê bê kirin . Herweha hîştik ku , dora 10000 kes , ( çi ji yên berjewandên wan bi rêjîmê ve girêdayî yan jî yên tirsonek ) , daxwaza xwepêşandana xwe bidin , û ta ku , li dawiyê ji wan 2500 nûner bimîne û berdewam bike . Bi ser ku , heryekî ji wan komek xeric ji bo piropoganda bi hemî awan virde û wêde rijandin .Lê , dîsa destlata Sûriyê weke hercar **Lîsta Zil** bi derxist . Herweha berî hilbijartin dest pêbibe , hemî kesên diçin perlemanê xuyadibin .

Ev çi şêt e ?!.

Hêjaye em bi bîra xwendevanan wînin ku, ragiyandina Şam û tevgera Kurd li Sûriyê , bi baweriya ku tu hilbijartinên azad li Sûriyê di siya van zagonên awerte de nîne , ji zû ve biryar dan ku , ne wê navan pêşkêş bikin , ne jî wê biçin dengdanê . Xuyaye tiştê bûye jî , rastîna wê tekûz dike .

## Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên Rojava li Derve

e-mail:hevgirtin@rojava.net

### Ji kovara Pirs û rojnama Newroz re.



Wê ji 28-30.04.2007 Kongireya sêyemîn a Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên Rojava li Derve li bajarê Göteborg-Swêd lidar keve.

Emê pir kêfxweş bin ku em têbînî, pêşniyar û birûskên we di dema pêş de werbigrin.

**************************

## Bersiva Newroz û Pirsê

Komîteya Ragehandinê ya Hevgirtina Rew§enbîrên Kurdên Rojava li Derve..

Hevalên berêz.. Dema we hemiyan xweş be.

Em kongira we ya sisiyê pîroz dikin û ji we re serkeftin û bextewariyê dixwazin.

Hevkarên hêja.. Gelek rew§enbîrên me hema dema ku bask pê dikevin, difirin diçin li (xakbuhi§ta) Ewropa dijîn, ev jî ziyaneke giran digihîne civaka me li welêt. Ji ber ku damezrandina civateke hevgirtî, berhemdar, pêshketî û azad, ber gi§an bi raman û keda rewshenbîran pêk tê.

Du hêviyên me ji kongira we hene:

Yek: Deng û berhemên we bigihên mirovên me li welêt.

Didu: Bi pênûs û ramanên xwe alikariya weshanên ku bi Kurdî li welêt derdikevin bikin.

We hemiyan silav dikin

Serkeftinê ji kongira we re

**Desteyên birêvebir ên:**

**Kovar PIRS**
**Rojnama NEWROZ**

**EFRÎN 18.4.2007**

## Bersiva wan : 19.4.2007

Brêvebirên Pirs û Newroz

Silavên germ

Em bi navê hemî komîteyên HRKRD-yê û bi navê endamên xwe û beshdarên

kongireya sêyemîn a Hevgirtina Rewshenbîrên Kurdên rojava li

derve، spasiyên xwe yên germ û dilsojane aresteyî we dikin.

Pishtgirî û helwesta we ji boyî me cihên serbilindî û shahnaziyê ne.


Li gel rêz û silavan

Komîteya amadekirina kongireya sêyemîn a

Hevgirtina Rewenbîrên Kurdên Rojava li Derve

# Kurdosman çû ser dilovaniya xwedê

Li gundê Şêx Bila, herêma Kurdaxê, di sala 1929 an de, Osman kurê Mihemed ji dayîk dibe. Ji destpêka jiyana xwe ve, di rojên dijwar û tarî de, piştgiriya partiya Komonîst dikir. Di destpêka salên 70î de, derbasî nav



refên tevgera Kurd dibe.Bi dil û can, di nav gelê xwe de, dixebitî. Lewre jî, bi navê Kurdosam dihate nasîn.

Di 7ê Avdarê de, dil rawestî , li 8ê Avdarê bi beşdariya heval, hogir û berketiyên wî, di goristana gund e tê veşartin. Li ser gornê, dostê wî, birêz Tahir Dîko, , bi dev sincên wî, ji beşdaran re xuyakir.

Bi navê destlata weşna Newroz û xewndevanê wê , em serê heval û malbata wî saxdikin .

www.arsivakurdi.org

# Çiyayê Lêlûn di nînika Merwan Berekat de

Pirtûka ((Çiyayê Lêlûn di nînika dîrokê de)), pirtûkeke nû ye li ser perçakî ji navça Efrînê hatiye nivîsandin. Mamoste Merwan Berkat ew çêkiriye.




Pirtûk di sala 2006 an hatiye çapkirin. Pelên wê ji pîvana orte ne /20*14/ cm. Ew ji 240 rûpelan pêk tê. Wek li ser qaba hundur hatiye nivîsandin, pirtûk ((lêkolîneke ciyolocî, dîrokî, shûnwarî, civakî belgekiriye)).

Pirtûk bi shêweyê klesîkî nehatiye dabesh kirin, tenê navnîshanên qaling û bendikên wê di bin re hatine rêzkirin. Navnîshanên qaling ev in:

Wateya navê Lêlûn.
Bingeha ciyolocî ya Ç. Lêlûn.
Xaknêgariya xwezayî.
Ç. Lêlûn di serdemên berî afrandina nivîsandinê de.
Ç. Lêlûn di serdemên berî zayînê û pishtî zayînî de.Jiyana olî li Ç. Lêlûn.
Shûnwarên girin û shêngehên Ç.Lêlûn:
Rêkên kevin li Ç.Lêlûn:
Sedemên malbarkirin ji Ç. Lêlûn.
Ziman li Ç. Lêlûn
Adet li Ç. Lêlûn
Jiyana aborî li Ç. Lêlûn
Rêk û rewsha çûnhatinî li Ç. Lêlûn
Geshtevanî li Ç. Lêlûn.

Erê gelek zaniyar, lêkolênvan û rojhilatnasan li Ç. Lêlûn lêkolîn kirine û nivîsar weshandine, lê digel ku hin zanishwer di pirtûkê de di warên lêkolînê de jî bikurtî hatine nivîsan û shrovekirin . lê shamîkirineke vê pirtûkê ya cuda û shêrîn heye, dihêle mirov wê ji rûpela destpêkê ta ya dawiyê bixwîne.

Birastî ev pirtûk a yekê ye ku wilo bi hûrikî û bi ferehî li ser Ç. Lêlûm daxive. Hêjayî gotinê ye, ku rêzdar M. Berekat bi xwe ji Ç. Lêlûn e, li gundê Soxanekê hatiye dinê û lê dijî. Ji ber wê jî, ew deverên çiyayê xwe kevir bi kevir, mit bit mit, shikêr bi shikêr, bost bi bost geriyaye, û mirovên herêma xwe yek bi yek nas kiriye. Bêguman wî shûnwarên Ç. Lêlûn jî yek bi yek dîtine, kevir bi kevir çav lêkirine.

Birastî hêja ye ku pirtûk "Çiyayê Lêlûn" ji hêla her kes ve were xwendin, û di her mal û pirtûkxanekê de were dîtin.

**Rozad Elî** - 30.4.2007

www.arsivakurdi.org

# Sersal û çarşema pîroz

**W**ekî ku nas e, çarşema yekê ji meha Nîsana Şerqî, li ba Êzdiyan cejna Sersal û Çarşema pîroz e. Ew îsal ket roja 18 ê meha Nîsana Xerbî.

Wekî ku avsana Êzdî ya olî dibêje, di wê rojê de, hezretî Tawûs Melek serokê heft pêriyên mezin, ji Erşan dadikeve erdan û li rewşa miletê Êzdî dipirse. Ji ber wê jî Êzdî xwe ji wê rojê re amade dikin, cilên paqij û fodil li xwe dikin, derdikevin ber pîrozgehan, qurbanan dikin û şahiyan li dar dixin.


Îsal bi sedan Êzdî, digel gelek Kurdhez, di şahiyên cejnê de beşdar bûn û ew pîroz kirin.

Cejin li sê deran hate şên kirin. Li serê çiyayê Parsê li ber pîrozgaha Parse Xatûnê. Li çiyayê Lêlûn li ber pîrozgeha Çêlxanê. Û li ber girê Endarê. Aheng bi def, zurne û stiran li dar ketin. Hin stranbêjên naskirî mîna Elî dawûd û sazbendên hêja jî lê beşdar bûn. Bi hunera Kurmanciya ciwan û bêhna gul û kulîlkan ji pêşwazî li hezretî Tawûs Melek kirin û cejin pîroz kirin.

Li Endarê, Şêx Mihemedê Kalo ji gundê bircê çend Qewlên olî gotin û bala beşdaran bir ser rewşa ola Êzdî.

Li Çiyayê Parsê, roja Sêşemê 17ê mihê, gava ciwanan dora pîrozgehê dimala, peyayên asayişên navça Ezazê hatin çar ciwanên 14 ta 17 salî girtin û roja din rakirin Helebê û ta roja nivîsandina vê nûçeyê hîn girtîbûn û.

Rewşa ean nediyar bû



Mirov dipirse, kîjan ehmaqa kane bêje, baxçê bi gulên ji rengekî ciwantir e. Ji kûraniya dîroka mirovatiyê de mafên olbawerî û Xwedêparêziyê hene û rewa ne. Bi girtin û zîndankirinê ne raman dimirin û ne ol tên windakirin, li bervajî wê olbawerî tund û hişk dibin û mirov ditirse ku hemî gulên wî baxçî dibin xwe de bipelêxe. Lê em niha ne li wê ne.

Birastî, rêwresmên cejna Çarşema pîroz bi şêweyekî pir baş û şaristanî hatin lidarxistin. Reng û dengê gelê Kurd ên ji hezar salan ve zindî mane hatin dîtin û bihîstin. Em hêvîdar in rêwresmên vê cejna her sal werin lidarxistin, wateyeke civakî ya sinciyî û pêşverû bistîne û xelkê me yê Êzdî jî di xêr û xweşiyê de bin.

Em bi navê rojnama «Newroz» cejna Sersala Êzdî û Çarşema Sor pîroz dikin, û bextewarî û serkeftinê ji gelê xwe re dixwazin

**Dumaha:Serfrazî**… Ji dil û can em lidarxistina konferansa we pîroz dikin , serkeftinê jê re dixwazin , bi hêviya ku hemî heval û şaxên rêxistina Ewropa ya partiyê , bêtir li pirsa gelê xwe xwedî derkevin , siyaset û helwestên parta xwe , bi dilsozî biparêzin û bibine dengekî xweş , bilind û hêja , di pêvajoya xebata kurd de li welatên xerîbiyê

Serfirazî û pêşkeftin ji kar û barê konferansa we ya pîroz re

Bijî xebata gelê me yê kurd li Sûriyê bona Aştî , Azadî û wekheviyê .

Sipas ji guhdariya we re .

Komîta birêvebir ya partiya yekîtî ya demokrat a kurd li sûriyê – Yekîtî –

Pêşiya Gulana – 2007 –an

www.arsivakurdi.org

# Rûdaweke biv e

**Dîlan Zivigî**

**Ma** kÎ nizane ku , zimanê dê nasinama mirovan, hebûna wan weke milet li pêş xelikên cîhanê diçespîne. Wisan jî , rêjîmên şoven û dîktetor dema lêdanê û setemkariya xwe li serê miletên bindest dikin ta ku , wan tarûmar û tune bikin . Ew ji berî her tiştî zmanê wan bi her reng û awî qedexe dikin , ew baş dizanin ku dema zimanê miletekî were pişafitin bi hêsanî ew winda û tune dibe . Weha jî zor girînge tu carî netê ji bîr kirin ku em kurd ji sedê salan ve bindest û neserbixwe ne .Lewre jî, pir pêwîste ku , em girigiya zimanê xwe yê xweş û şêrîn nas bikin û nirxa wî bilind hilidine jor , zar û zîçên xwe il ser riya bav û kalan bi evîna zimanê dê perwerde bikin , tu carî qenciya `wan rêzdar û pêzanên zimanê kurdî yên nemir, mîna Miqdad Bedir-xan , Celadet Bedir-xan , Dr. Nordîn Zaza , Osman Sebirî , Reşêdê kurd û H .w.d yên ku , bi salan xwe dane ser riya xebatê , ji zû ve destên xwe dane ser birînê, pir cefa û zehimetkêşî di warê parastina zimanê kurdî de dîtine . Bi dehan berhemên xwe, weke sermiyan ji me re hêştine ? Vêca jî, îro em tev deyindarê wan lehengan e .Pêwîste ku , em şîret û gotinên wan ji bîra nekin , hema weke nimûne û mînak ku , nemir Nordîn Zaza herdem digot : Eger win dixwezin tarûmar û winda nebin divê win zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin û eger win dixwezin xwe bi xelikên cîhanê bidin nasîn dîsan zimanê xwe bixwînin û bidine xwendin. Loman jî , pêwîste ku em bînin zimên . Bêgûman bi xêra van nemir û rewşenbîran e, em kurd îro li beşê sûriyê, ji rojên pêşîn ve û cara yekemîn partiyên tevgera me ya rêzanî nirxa zimanê kurdî zanîn û dan ser milên xwe ku, roj ji rojê vê rûdawê hewş vedaye , da îro zanayên me kurdan pir bûne , ew jî bi serbilindî li zimanê dê xwedî derketine û bi dehan kovar û rojiname hatine û têne çapkirin, nemaze parta yekîtî ya demoqrat a kurd li sûriyê ji sala -1991-an ve bi coşekî pir bilind di warê zimanê dê de xebitîne li bajarê Helebê û saya birêz Dr. Evdilmecîd Şêxo bi dehan mamostên zimanê kurdî ava kirine , pir koris ji bo xwendin û nivîsandina zimanê dê çêkirine , di kovar û rojnaman de beşdar bûne. Ne jî çiqas mixabin weke Heyder Omer li vê dawiyê dibêje!. Ligel vê jî, di roja me îro û di civaka me ya kurd de nemaze li bajarên mezin mîna Şam û Heleb rûdaweke bive heye , ku hin malbat hene çi xwe bi xwe bi hevdu re bi zimanê biyanî[ Erebî] daxifin û zariyên xwe jî li ser wa riyê perwerde dikin , wan ji zimanê dê bi dûr dixin, qet nizanin ku bi vê awî hêvî û armancên dijmin û neyaran bi kar tînin ,ev li hêlekê û li hêla dî erik û stobariya xwe ji bîr dikin ku em tev di warê parastina zimanê kurdî yê hêja û şêrîn de berpirsiyar in, ta ku em li pêş nevî û nifişên nûgûha serbilind û xwedî rûmet dîyar bin ne jî rûreş û gunehkar bin.

www.arsivakurdi.org

# Keça Celadet Bedirxan: »Mafên dê û bavê min hatine xwarin« (bi deng)

Ji bo beşdarbûna di çeremenîn Konferensa Bedirxan li Berlînê de, keça Mîr Celadet Bedirxan, Sînemxan, ligel mêrê xwe Selah Sadela, xwediyê ferhenga Saladîn a ingilîzî-kurdî, hatiye Elmanyayê. Di hevpeyvînekê de bi Malpera Amûdê re, Sînemxan eşkere kir, ku di salên dawî yên jiyana diya wê Rewşen Berdirxan de, "gelek kesan tişt ji diya min stendin û lê venegerandin". Sînemxan diya kir ku ew hingî ne li cem diya xwe bû û ji ber vê yekê ew nizane bê ew kes kî bûn û çi bi xwe re birine. Keça Celadet Bedirxan, ku wekî "mîrê kurmaniya nûjen" tê binavkirin, ne li dij e ku grmera bavê wê bête guhertin, "lê divê komîteyeke ji kesên pispor bi vî karî rabin".

Hîn ta berî şeş mehan, Sînemxan Bedrixan ligel hevserê xwe Selah Sadela li Bexdayê dijiya. Li ser daxwaza serokwezîrê Kurdistana Iraqê Nêçîrvan Barzanî, ev şeş mehên wan in ku li Hewlêrê paytexta Kurdistana azad dijîn. Li ser guhertina gramera Celadet Bedirxan Sînemxan got: "Guhertin ne xerab in û ne şerm in, lê divê kesên ku guhertinan pêk bînin, kesine zana bin. Pêwîst e ku komîteyeke ji kesên pispor ji vê yekê re bête sazkirin."Keça Celadet Bedirxan herweha diyar kir ku mafên dê û bavê wê baş nehatine paraztin. Wê berdewam kir û got: "Di salên dawî yên jiyana xwe de, diya min yixtiyar bûbû û dixwezt alîkariya xelkê bike. Ez bi xwe ne li cem bûm, lê gelek kesan tişt jê stendin û lê venegerandin.




Mixabin ez nizanim bê ew kes kî ne. Eger min zanîba, minê navên wan gotiba. Ez dixwazim rastî derkeve holê û herkes bigihê mafê xwe."

Ligel ku piraniya berhemên Celadet Bedirxan û xanima wî Rewşen winda bûne, lê hîn jî çend tiştên hindik mane ku Sînemxan wan li cem xwe diparêze. Yek ji wan tiştan vexwendnameya ji bo beşdarbûna Konferansa Antîkolonyanîsim di sala 1957ê de li Atînayê ye, ku ji diya wê Rewşen Bedirxan e re hatibû şandin. Herweha belgeya desturdayina orîjînal ji bo derxistina kovara Hawarê jî di nav destên keça xwediyê Hawarê Celadet Bedirxan de ye. "Wekî dî helbestên bapîrê min Emîn Elî li cem min hene, tiştine kêm ên apê min Kamiran û herweha ferhenga bavê min a kurdî-kurdî jî li cem min in."

**Rojnamegeriya KurdîPîroz be**

*Bi boneya Roja 22ê Nîsanê, roja rojnamegiriya Kurd, Em bi navê komîta weşana NEWROZê Hemî kovar, rojname, nivîskar, rojnaemevan û gelê Kurd pîroz dikin û hêviya pêşketin û rojin azad ji wan re dixwazin*

www.arsivakurd.org

# Çavsoriya Rêjîma Turkan

Imbretoriya Osmanî, di şerê Belqan de, pir zeviyên dagîkirine ji dest çûn. Lewre, ji bo pirsa Ermen û Kurdan di Tirkiyê de, bi hovîtî serhildanên wan herdu miletan hilweşandin û bi hezaran gund û bajarok wêrankirin.

Rêjîma Kemalîzmê , hîn di wî xwenîde ye ku, İmbretoriya Osmanî vegerîne û zevîyên hevsiyên xwe dagîr bike. Loma jî, di sala 1973 an de, rêjîma Turkiyê bi mebesta parastina hemwelatiyên Turk li Qubrisê, bi hêzên leşkerî, beşek ji Qubrisê dagîrkir û Qubris kire du beş.

Piştî rûxandina destlata hovê hreî bi van û deng, di Rojhilata Nanavî de, bi alîkariya hêzê hevbend, di Nîsana 2004 an de , destlatên derdora Iraqê û bi taybetî, destlata Tirkan. Carina bi mebesta hebûna gerîleyên PKK û carina bi mebesta parastina hemwelatiyên Turkumen li Kerkûkê her dere cav sor dibe û rûyê xwe yê ne mirovane û demoqrat ji bo azadkirina beşê Kurdistana Iraqê dide xuyan.

Rastiya herî berçav ew e ku, daxwaza destlata Tirk, hilweşndina hukumeta Kurdistanê û dagîrkirina Kerkûkê ye. Ji ber gava xala 140, ji destura Iraqê pêk were, wê gavê, Kerkûk dikeve çarçewa Kirdistana Iraqê. Ev bi xwe tirseke mezin dixe nava destlata Tirk. Ji ber wê jî, ceneral, serokwezîr û şalyarê derve yên Tirkiyê gefguran didin herêma Kurdistana Iraqê. Lê, serokê herêma Kurdistaê birêz Mesûd Berzanî, bi hişmend û mêranê, bersiva destlata Turkiyê daye. Ew bersiv bûye cihê vehesa hemî Kurdan. Lewre, hemî hêz, kurdperwer, rewşenbîr û dezgehên Kurd bûne piştevan ji herêma Kurdistana Îraqê re.



***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org